

Rejîma Tehranê
xwekujî kiriye çand!

»»» R:7



Ji bo çêbûna
yekîtiyekî baş, tenê
gotin bes nîne

»»» R:3



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (389) 07-01-2021 Buha (1000) Tûmen*

Gelo niha xelk
kîjanê bawer
bike?

»»» R:4



Birayê ne ji dayê,
wekî telîsê kayê

»»» R:6



Girtîgeha mezin

Saziya Çavdêriya Mafê Mirov ya Netewên Yekgirtî di nûtirîn rapora xwe a sala 2020`î de eşkere kiriye ku Komra Îslamî ya Îranê, pileya 2`emîn a bînpêkirina mafê mirov li ser asta cîhanê heye.

Li rêzbendîya ku Saziya Çavdêriya Mafê Mirov ya Netewên Yekgirtî belav kiriye, hatiye ku “Receb Teyîb Erdoxan, Kîm Cong Ün û Vêlademîr Pûtîn” bi rêz li pileya 8, 9 û 10`emîn yên bînpêkerê mafê mirov di sala 2020`î de ne.

Wê Saziya Mafê Mirov, wêneya Xamineyî li tenîştê 9 rêberên dîktator û ne-demokratîk daniye û îşare bi beşek ji wan cinayetên kiriye ku bi destûra “Xamineyî” hatine kirin.

Saziya Mafê Mirov di despêka sala 2021 a Zayînî de, rêzbenda 10 welatên bînpêker ên mafê mirov di sala 2020`î de belav kiriye ku Îran piştî “Komara Xelqê Çîn”ê li pileya 2`emîn a wê lîsteyê de ye.

Beşek ji wan bînpêkirinên mafê mirov a rejîma Îranê, îdam, serkut, sepandina cezayên giran û bêserûşûnkirina hevweletîyan li xwe digre.

Ji aliyekî din ve, Saziya “Nûçegihanên Bêsinor” di rapora xwe ya salane de belav kiriye ku Îran mezintirîn bikujê rojnamevanan di nîvsedeya derbasbûyî de ye.

Welatên “Mekzîk, Hindîstan û Pakîstan” bi xirabîrîn û nearamtirîn welat bo çalakiyên rojnamevaniyê ne, û Îran jî tenê

welatek e ku bi eşkere û rohn destûra kuştina rojnamevanan dide û li nîvsedeya derbasbûyî, ti welatek bi qasî Îranê rojnamevan nekuştine.

Berê jî li meha Rezberê, “Federasiyona Navnetewî a Mafê Mirov” li raporeke 60 rûpelî ya bi navê “Lêxweşbûn bo kesê tunîne” zêdebûna sepandina cezaya îdam li Îranê”ê de ragihandibû ku îdamkirinên bêsinor li Îranê de bûne rûpelek reş li dosiyeyên mafê mirov yên wî welatî, bi awayek ku piştî Çînê, Îranê pileya 2`emîn ya îdamkirinê li ser asta cîhanê heye; Herwisa îşare bi vê yekê jî hatiye kirin ku di 9 mehên despêka sala 2020`î de, nêzî 200 kesî li Îranê hatine îdamkirin.

Rewşa mafê mirov li Rojhilatê Kurdistanê, çend qatan xirabtir ji rewşa îşarepêkirî ya seranserê Îranê ye; Navenda Amar a Saziya Mafê Mirov a “Kurdpa”yê di dawîya sala 2020`î de li raporeke cudakirî ya amerî de, amara kuştin û birîndarbûna kolberan li 9 salên derbasbûyî de daye xuyakirin ku bi kurtî wiha ye: Li sala 2012`an heta 2020`an 1382 kolber

hatine kuştin û birîndarkirin (469 kuştî û 913 birîndar) 28 kes ji wan kolberên ku hatine kuştin û birîndarkirin temenê wan jêr 18 salî bûne. %78 ji wan kolberan bi teqeya rasteraşt a hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hatine kuştin û birîndarkirin. Mirin û birîndarbûna wan bi sedema kevtin ji bilindahîyan ve %7 bûye. Bi sedema sir û seqem û hatina reniyê %6 bûye. Bi sedema teqîna mînê %5 ji kolberan mirine û yan jî birîndar bûne.



Herwisa di heyama 9 mehên derbasbûyî yên despêka sala 1399`an de, bi gelemperî 88 welatîyên Kurd bi tohmên “ewlehî”yê ji aliyê Dezgeha Dad a Komara Îslamî ya Îranê ve, cezaya girtîgeh û cezayên dinê li ser wan de hatiye sepandin.

Di amareke din de jî “Kurdpa”yê eşkere kiriye ku di heyama 9 mehên derbasbûyê yên despêka sala 1399`an de, bi gelemperî 373 welatîyên Kurd li Kurdistanê hatine binçavkirin ku 333 kes ji wan binçavkiriyan di wê heyamê de ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine binçavkirin.

Cezayên herî kêr ên sepandî 2 meh, û yên herî zêde jî îdam bûne.

Herwisa di wê heyamê de bi gelemperî 29 welatîyên Kurd hatine îdamkirin ku 3 kes ji wan siyasî bûne, û bi giştî di wan girtîgehan de hatine îdamkirinê: “9 kes li girtîgeha Sînê, 7 kes li girtîgeha Urmîyê, 2 kes li girtîgeha Meraxê, 3 kes li girtîgeha Seqîzê, 2 kes li girtîgeha Kirmaşanê, 1 kes li girtîgeha Miyanduavê, 1 kes li girtîgeha Recayî şêhir, 1 kes li girtîgeha Mihabadê, 2 kes li girtîgeha Nexedê û 1 girtiyê siyasî li yek ji padiganên bajarê Şîno yê”.

Bi giştî ya ku ew amar didin xuyakirin ev raştiya ye ku niha Îran bo tev tex û qatên civakê û bo tev kesên din ku nasnameyeke cuda ji nasnameya erêkirî ya dezgeha “Wilayetê Feqîh” hene, girtîgehek e bi diwartirîn û tundtirîn cezayên xwe ve.

Sergotar

Sal û hejmar

N: Kerîm Perwîzî

Gelek caran di analîza mijarên siyasî, civakî û aborî de, hejmar bi awayekî tene tenîştê hev, ku bal û hizra mirov wisa bo aliyê vê yekê tê rakêşandin ku renga tiştê ecêb biqewime.

Bo mînak, hekî rêkevtê roj û hejmara mehan di haleteke taybet de ku hejmara salê jî wekî wan bê xuyakirin, ew tiştê balkêştir dibe û çavni-hêriya bûyerên ecêb li mejiyê mirov de çêdibe. Wekî mînak, tu wisa hizir dikî ku roja 10 li meha 10-ê de ecêb e, an hekî roja neh û meha neh li sala nehê de ecêb e, an hekî roja neh û meha neh li sala nehê de ecêb e, an hekî roja neh û meha neh li sala nehê de ecêb e.

Ev yek jî mejiyê mirov ve çavkanî digrin, ku mirov ew hejmar, rêkevt, û seraştiya hejmaran, pê tiştê ecêb e, û li seranserê dîrokê de, û di civakên cuda de, heta li cem mirov hin jî hejmaran pîroz bûne û heta hindê hejmar jî wekî biyûm hatine binavkirin.

Lê salek ku jî nû ve deşt pê dike, wate sala 2021'an a Zayînî saleke girîng û çarenivîs-saz e; Ne jî ber vê ku 20 û 21 li pey hev hatine, belkî li ber vê yekê ku li salên derbas-bûyî de hin tişt qewimîne û îsal dema derketina encama hin jî wan e, û di raştiyê de derfeta xuyakirina encaman û bandora bûyerên berê zêdetir dibe.

Ji aliyekî din ve, hatina gorê ya hin biryar û yekalibûna hin jî pirsan, bi taybet jî aliyê siyasî û aborî ve wisa dike ku sala bê salek girîng û balkêş be.

Di sala bê de, piştî biryarên stratejîk ên Amerîka bona

çawa belavkirina hêzên xwe li cîhan û devera Rojhilata Navîn de, renga hin rikeberî û guherîna hevkeşeya hêz ber bi aliyekê ve here ku sînorê rikaberîyan bête xuyakirin û gelek caran di wan sînoran de tevliheviyek girîng biqewimin.

Ji aliyekî din ve rikeberî û pirsgerêkên di navbera rejîma Îran û welatên Rojavayî de û herwisa qedera hin jî pirsgerêkên deshilat û rikeberîya hêzan li nav berpîrsên rejîma Îranê ku di senariyoya Serkomariya rejîmê de xwe derdixe, renga li ser qedera rejîmê bandoreke berçav hebe.

Ji wan hemûyan girîngtir, bandora bêkarî, daketina nirxa neftê û îflasa aboriya rejîmê piştî belavbûna vîrûsa Koronayê li sala bê, bandordariya wan di deverê de zêdetir bîne xuya, û renga piştî gelek belayan û bêkariyê di dîroka cîhanê de, bahozeke din bê afirandin û bagera wan bûyeran, gelek qederên çavnihernekirî li pey xwe bîne.

Ya ku li ser me dikeve, di devereke stratejîk de û li cugrafiyayek ku bi aloziyan ve hatiye vehûnandin, emê xwe çawa bo amade bikin û bikarin ti bandorekê li ser wan bûyeran danên?

Peyama pîrozbahiya Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta sala nû ya Zayînî



Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî” bi hilkefta sala nû ya Zayînî peyamek belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Peyama Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta sala nû ya Zayînî

Sala nû ya Zayînî pîroz be

Bi hilkefta sersala nû ya Zayînî û jidayîkbûna Hz. “Îsa Mesîh”, ez pîrozbahiyê li hevvelatîyên Kirîştîyan li Îranê û nemaze li welatîyên Kirîştîyan li Rojhilatê Kurdistanê dikim, hêviya me ye ku sala 2021'an bibe sala aşîti û pir ji xweşîyan bo tev alîyan.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

31'ê Kanûna Pêşîn a 2020'an

11'ê Befranbara 1399'an a Rojî

Ji bo çêbûna yekîtiyekî baş, tenê gotin bes nîne



N: Nûredîn Sofîzade

Demek e mijara çêkirina yekîtiyê di nav gelê Kurd û hêzên siyasî de tê baskirin. Gava ku kesek devê xwe vedike an dipeyve, peyva wî ya sereke gotina hewcehiya çêbûna yekîtiyê ye. Piraniya wan wiha dibêjin: “Kurd digel hev yek nînin, xwe sebebkar in ku negihîştine armaca xwe, îxanetê bi hevdu dikan, hewce ye di nava kurdan de yekîti û aşîti hebe”. Lê dema ku tu mêze dikî ew kes amade nîne berjewendiya xwe ya takî û hizbî û girûpî danê qiraxê û bibe pêşeng bo çêkirina wê yekîtiya ku bas jê dike. Dibe em van raştiyan bibînin ku di destpêkê de kê berpirsyarê çênebûna wê yekîtiyê ne?

Di 2- 3ê salên derbasbûyî de, 5 hêz û aliyên siyasî di bin navê Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê (NHPKÎ)ê de xwe gihandine hev û ji bona hinek mijaran hevxebe bûne, bê guman wê yekê heke çî gelek kêmasî jî hene û têra çêkirina yekîtiyek bi hêz bo xebata Rojhilatê Kurdistanê nake, lê dîsan jî cihê dilxweşiya gelê me bû, bandorekî baş di çêkirina yekdengiya di nava gel de hebû û pêngavekî cihê pêzanînê ye. Mixabin yek ji wan hêzan gelek pê neçû ku derkevtina xwe di nava wê navendê de ragihan û mane 4 hêz ku di eslê xwe de ew jî jev cuda bûyî yên 2 hêzan in, disan jî ev biryar hêvî û pêngawekî nû bû.

Bo vê ku gel û partiyên siyasî yên me bigihîne hêvî û armancên xwe û ser kevin, herçiqas ew alîkariya girîng û baş e, lê hewce ye ew navend û hêzên tede di gotin û çalakiyên xwe de, di nav teorî û

pratîka xwe de, aliyê kêr li ser wan xalên ku di wê navendê de lihev hatine, pêbendê hêlên diyarî kirî yên xwe bin.

Em hemû dizanin ku rege her kîjan ji wan partiyan bîr û bawerî (teorî) û xetekî fikrî ya ji hev cuda jî hebin, lê aliyê kêr her çar alî di wê navendê de li ser xebat bi dijî rejîmê, çareseriya pîrsa netewî di şiklê Fedralîzm, demokrasi, hîlbijartina azad, cudahiya dîn ji hikûmetê.... xwediyê yek helwêstî ne, lê gelek mijar û xalên dinê jî hene ku hewceye ew navend bêxe ber rojeva karê xwe, weke: Dîplomasî li astê navnetwî de, hevxebe û yekgotarî di medyayên xwe de, yek biryarî rû bi xelkê Rojhilatê Kurdistanê, û xala herî girîng çêkirin û pêkanîna hêzekî hevpar a serbazî, weke hêza nîştimanî û amadekirina wê hêzê bona egera her pêşhatekê.

Gava ku em nekarin di wan warane de jî pêngava bi-avêjin, û me jêvebe ku eva me heta niha kirî bes e, bêguman em serkevtî nebûne û me nekariye bîngehekî qahîm ava bikin ku li paşerojê de nîgeran nebin.

Digel vê ku daxwaza gelê me gelek ji wê hindê jî zêdetir e û çavniheviyekî zêdetir ji partiyên xwe yên xebatkar hene, lê eva ku hewce ye û ev partî di vê qonaxa niha de dikarin bikin û ez bawer im gelek îza nîne, dikarin bi çêkirina dîplomasiyekî baş bi navê wê navendê li astê navnetwî de, hevxebe û yekgotarî di medyayên xwe de, yekbiryarî rû bi xelkê Rojhilatê Kurdistanê û çêkirin û pêkanîna hêzek hevpar a serbazî, weke hêza nîştimanî pêngaekî nû û dilxweşker bihavêjin û hêviyekî nû bidine gelê xwe.

Gava gotin û dîtinên me jî çalakiyên cuda be, wata karê em namîne, yan kêr bandor dibe! Kesên ku di nav jiyana şoreşgerî nîrx dane û parek ji temenê xwe jêre danane, hemû dizanin ku bîrûbawerî û nerît wekî goşt û heştî bi



hev re girêdayiye. Îmkan nîne ku hemî partî wekî hev bifikrin û her partiyek jî heke bixwaze hejmûnê û îdolojiya xwe bi ser partên dinê yên hevalbenê xwe de bisepine ku ev jî wê bifikrin û bêjin û siyastê bikin, ji xeyalekê zêdetir nîne. Lewra girîng eva ye ku em bikarin bi wan reng û cudahiyan digel hev kar bikin bona armanca netewî ku armanca hevpar a me hemûyan e.

Bila bi berçavgirtina wê raştiyê em kar bikin û bizanin kanê çêkirina yeketî û hevxebebiyê hewce ye yan ne?

Ger bersîva me erê be, dibe em bizanin ku pêwîstiya vê hewcedariyê jî çiyê?

Dibe em hemû bizanin ku yekîtiya partiyên xebatkar ku bawerî bi pîrsa netewî henî, berî her tiştî dikare pêngavek be bo çêkirina yekîtiya netewî di nava gelê me di Rojhilatê Kurdistanê de.

Dema ku em erk û berpirsiyarên ku dikevî ser milê me bi cîh bînin, dê xebat û doza me li her warekê de pêşkevtinê bi xwe ve bibîne ku eva jî daxwaza gelê me ye.

Lê dema ku em erkê xwe û soza ku me dayî gelê xwe baş cî bi cî nekin, bê guman emê heke Farsan gotî dê her der ca lêdin û asinê sar bikutin.

Herçiqas ku hee kîjan ji hêzên xebatkar û siyasî gorî îmkan û şiyana xwe bandor hene li ser xebatê, lê gava yekîtiyekî baş û qahîm bê avakirin, hem dikare di qonaxa niha de bigurtir xebatê pêş bêxe, hem hêviyekî mezin dide gel, û hem ew yekîti dikare bibe baştirîn alternatîva piştî egera her guhartinekê, ne tenê di Rojhilatê Kurdistanê de, belkî dibe hêz û parek ji alternatîva seranserî ya di Îranê de jî.

Bi hêvîya pêngavên hewce bona hasilbûna wê hêviyê.

Gelo niha xelk kîjanê bawer bike?



N: Elî Munezemî

Evên ku siyaseta û metoda siyasethîkirina karbideştên rejîma Koama Îslamî a Îranê nas dikin, dizanin ku ew hemû carê niyeta xwe li bin kofiya xwe de wedişêrin û qet wê belav nakin. Îranê ku her di serdema şerê tev Îraqê de xwezî dixwast çekên etomî hebin heta di şer de serkevtinê bi dest bînin, bi kiriyar kar li ser wê daxwazê kirin û bi nepenî û eşkere cehd kirin wê daxwazê bînin cî. Lê li ber givaş û zexta dewletên Rojavayî, wan bernamêya xwe ya nepenî bo çekirina çekên etomî di 2003'an de dane sekinandin. Wan herwisa li ber hilgirtina embargoyan û baştirkirina rewşa xwe ya aborî bo ku bikaribin bûdceya pêdivî bo grûpên terorîstî peyda bikin û hejmoniya Îranê li Rojhilata Navîn de pêş de bibin, rêkvevtina «Bercam»ê tevî welatên Rojavayî wajo kirin û bi wê hindê jî bernamêya xwe ya meyandina uraniyomê bi tîrtiya 20% ku bi santirfiyoyê nifşa yekem yê IR-1 plana wê pêş de dibirin, sekinandin.

Lê dema seroktiya «Trump» wek Serkomarê DYA, DYA li wê rêkvevtinê derketin û li raştî de îdê ew rêkvevtine çî girîngiyek xwe nema.

Piştî kuştina pasdar Fexrîzade ku berpîrsê pişka çekdarî ya bernamêyan etomî yê Îranê, parlemana rejîmê biryar da ku dewleta Îranê dîsa meyandina uraniyomê ya bi tîrtiya 20% dest pê bike. Rojnameyên Îranî bas li vê yekê dikin ku Îranê bernamêya xwe bo meyandina uraniyomê heta % 50 dest pê kiriye ku wî karî di binkeya etomî a «Fordo» de

bi rêka santirfiyoyên nifşa 6an ya IR-6 dixwaze cî bi cî bike. Ev yeka ne tenê heta bi nemana «Trump» li serokatiya DYA jî yê rewşa zivirîna DYA bo rêkvevtina «Bercam»ê yê dijwar bike, lê dikare bibe sedemê derketina şer jî.

Rejîma Komara Îslamî a Îranê di meydana siyasî de bi cureyekê tevdigere, ji ber ku Rojhilata Navîn bikare seqamgîr be û balansa hêzê tede were parastin, ew herêm qerdarê şerekê ye. Goreyî ku xuya dike, rejîma Îranê hêcetê pêdivî bo dadperwerîbûna wî şerî diafirîne. Ew hêceta bi wî awayî em dikarin xalbendî bikin:

1. Gefên Îranê li DYA li ber kuştina terorîst Qasim Silêmanî û li Îsra'îlê li ber xatirê kuştina Fexrîzade û tometbarkirina dewletên endam li NATO bi wê hêcetê ku çekên bikarhatî li kuştina Fexrîzade de yê Arteşa NATOê bûne.

2. Bînpêkirina peymannamê navnetewî û meyandina uraniyomê bi tîrtiya 20%.

3. Êrîş bo ser balyozxana DYA li rêka milîşayan ve

4. Hevkarî tevî girûpên terorîstî wek Hemas u Hizbullah Lubnanê.


5. Gef bo ser ewlehiya Îsraîlê li tixûbên Sûriye-Îsraîlê. Di beramber wê reftara rejîma Tehranê de jî DYA ew

reaksiyona ji xwe nîşan daye:

1. Firîna balafirên DYA li ser kendavê.

2. Hişdariyên «Trump» bi Îranê re.

Xala herî balkêş di wê nakokiyê de eva ye ku Îran jî aliyekê gefa dixwe bo tolehildanê û jî aliyek din ve jî balyozê wê yê derve, Cevad Zerîf, dike havar ku DYA bi dû hêncetan digere ku şer tevî Îranê dest pê bike. Bi qevlê mezin dibêjin: «Hem lê dide, hem jî dike havar.» Wî li «Twitter»ekê de nivîsiye ku



«Trump» li ciyê berxwedan li dijî Koronayê balafirên B-52 û çekdaran dişîne «herêma me» bi miliyardan Dolar dahata DYA bi heder dide. Ew herwisa dibêje ku Îran li dû şer re nîne û tenê berevaniyê li xelk, ewlehî û berjwendiyên xwe dike. Lê Wezîrê Derve ê rejîmê li xwe napirse ku gelo çima ew dikarin li Afrîqa, Amerîkaya Latîn, Rojhilata Navîn, Evropa û ... hêza çekdar bişînin û girûpên terorîstî pêk bînin û karê terorîstî bikin, lê bo DYA ne rewşa ye ku hêzên xwe yê leşkerî bo ewlehiya navçê û şahdemara tranzîtiya enîrjiya cîhanê hêzên xwe neşîne? Gelo kê sebebkar e ku DYA hêza xwe dişînin? Gelo eva pasdarên Îranê nînin ku her gav gefan li welatên navçeyê, xelkê xwe, DYA, Îsraîl û ... dixwin û wan bi nemanê tehdîd dikin? Lê heya dilopek ku eger rîjiya, taze nayê xirkirin.

Gefa ku Îsmâil Qanî, serokê nû yê Spaha Quds a terorîstî ku belgeyek haşahilnegir e bo terorîstbûna rejîma Îranê, bikujê terorîst Silêmanî tehdîd dike ku rengbe her di mala wan de kesek peyda be ku wan bikuje. Wî herwisa got ku ew karbidetên DYA ku li kuştina Silêmanî, terorîstê jimare yek ê cîhanê de dest hebûye, li çî ciyekê ewlehiyê de nabin.

Eva tê wê wateyê ku eger li destê rejîma terorîstî bê, yê li ser xaka DYAYan li her

ciyeke dinyayê, kiryarên terorîstî bikin. Ew yeka ne tenê tehdîdeke bo ser ewlehiya DYA, belkî hemû welatan rûbirûyê hereşa xwe bo encamdana kiryara terorîstî dike.

Xuya ye ku DYA baş hişmendiya karbideştên rejîmê nas kiriye. Li ber hindê jî «Trump» li 2 meydanên de bo ku pêşiya wan terorîstan bigre, kartên xwe yê baş leyîştin. Ji aliyekê ve gef li Îranê xwar ku eger bi xwe yan li rêka milîşiya-terorîstên aligirê xwe ve bixwaze zirarê bide yek hevwlathiyê DY-Ayê, ew yê berpîrsiyar bin. Ew karta girîng ku rejîmê bi salan e bi kar dianî, ji destê hate derêxistin. Ji aliyek din ve jî bo ku nîşan bide ku ew gefa wî li rejîmê ne ji xwe re ye, bi şandina balafirên B-52 û hêza çekdar xwest eyan bike ku ew li ser wê gotina xwe micid e. Li ber hindê jî zû hindek karbideştên Îran hatine xwe û gotin ku li hizra tolehildanê de nînin. Mezîne me dibêjin ku «topiz li biheştê hatiye!»

Li ber hindê jî Îranê li salvegera kuştina Silêmanî bi destê DYA, tenê li Îranê û hindek welatê wek Îraq û Lubnanê ku girûpên terorîstî yê aligirê wan hene, hindek meş û silogan avêtin û bi wî awayî jî salvegera kuştina wî terorîstî xilas bû. Em dibînin ku bi nemana terorîstê jimare yek, dinya xwestir û ewlehiya zêdetir e.

Doza netewî û nasyonalîzma Kurd

N: Zanyar Amedî

Nasyonalîzm, mirov tam nikare bi nav bike. Ji ber ku wateya nasyonalîzmê gelek fireye. Kûtayî em bêjin nasyonalîzm; li ser erdnîgarîyekî bi kolektîfên yekîtiya ax, ziman, dîrok û çandê de sînor danîne. Di Dêhiladariya modern de jî netew-dewlete.

Nasyonalîzm parçekirina împaratoriyan bi kolektîfên nîrxên netewî, di sedsala 18ê de gor zanîna cihanê şoreşa Fransî tê çekirin. Sedsala 19 û 20an de di hemû cihanê de belav dibe, împaratoriyan cihanê parçe dike. Piştî şoreşa Fransî dêhilatdariya netewe-dewlet bi sinoran rengê modern hatine pêşniyarkirin. Netewe-dewlet hemberê bêzagonî, asîmîlasyon, komkujî, înkari û... hwd bûye mafê çarenivîsiya gelên bindest di cihanê de. Niha jî nasyonalîzm di aloziya cihanê de bi taybetmendî ser rewşa Rojhilata Navîn, bandora şer, aborî, siyaset, birokrasî û gelek aliyên aloziyan bûye remza çareserkirinê.

Encama nasyonalîzma Kemalîst, Baasîzm û Farsîzmê bûye remza, nîjatpereştî, dagirkerî û kolonyalîstî, û her bi wê sedemê jî bûne dîktator. Nasyonalîzma Kurd jî hemberê wana paradoksiye. Ji ber wê ye ku divê em nasyonalîzm ser doza Kurdistanê, ji nasyonalîzma dewletên dagirker û kolonyalîst cuda binirxînin. Girîngî û rola nasyonalîzmê di xebata netewî de çawa bûye, û niha çawa dimeşe? Dewletên ku Kurdistan parçe û parve kirine, hemberê wan, doza Kurdistanê tekoşîna modern, bi navê nasyonalîzma Kurd herdem xebat kirîye.

Nasyonalîzma Kurd; Di hêla mirovatîyê de ser axa welat, rêzê ji hemû nîrxên mirovatîyê digre, sazîya demokrasî, aşîti û wekhevî

armanc dike. Di hêla netewî de jî nasyonalîzma Kurd, hemberê dagirkerî û kolonyalîstîye. Raştiya parçekirin û parvekirina Kurdistanê jî ser çarenivîsiya yekîtiya kolektîfên ziman, ax û dirokê ya netew-dewlet e.

Pirsa nasyonalîzmê dikeve çarçêva bîrdoziyê, bîrdozî; komek ramanên ramyarî, hiqûqî, zaniştî, felsefî, olî, exlaqî, estetîkî ye ku doktrînek siyasî an civakî pêk tîne û tevgera hikûmetek, partiyek siyasî, qatekî civakî raştast dike. Du tekoşînên bîrdozî hene. Yek ji wan doza qatiye anku çinayeti, ya din jî doza netewî ye.

Em di nav dewletekî dagirker de doza sinifê binirxînin. Doza sinifê; çepgirt, rastgirt, lîberal, demokratên civakî xwe bi rêxistin dike. Rêza xwe ji nîrxên sazîyên dewletên kolonyalîstan al, sirûd û yek dewlet tîne. Ti pîrsgirekekî di navbera sînoren dewleta dagirker, yekîtiya dewleta dagirker û bernameya rêxistina xwe de nabîne. Zagona dewleta dagirkere totalîter qebûl dike. Doza gelê bindest doza netewî mêze nake, pîrsgirêkek serwerî nabîne, doza gelê bindest bi çande/ demokrasî binav dike, di nav pîrsgirêkên sinifên dewleta kolonyalîst de dinirxîne. Tekoşîna xwe bi demokratîk-bûna dewleta dagirker û doza dêhilatê re girê dide. Mînakekî em bêjin; navenda siyasetê wî ne Dîyarbekir, Mihabad, Hewler û Qamişlo ye, belkî navenda siyasetê û rêxistina wê Enqere, Baxda, Tehran û Şam e. Çalakîya teorîk-pratîkî ye siyasetê armanc dike ku civaka gelê bindest veguherîne civatek nûjen ne bi nasnameya xwe, belkî bi nasnameya neteweya dagirker. Doza sinifê, rêxistina xwe bi tevgerekî neteweyî nabîne, belkî bi tevgerekî azadî dibîne. Biratiya gelan û biratiya ummeta îslamî dike armanca tekoşîna xwe. Ew siyaset jî di navbera gelê bindest û serdest de entegrasyonîzm e, û hêzê dide

asîmîlasyonê, pergala dewleta kolonyalîst xurt dike û gelê bindest di siyasetê xwe ya entegrasyonê de difetisîne. Ji bo gelê bindest re ne rewşa ye ku di nav dewleta kolonyalîst de yekser mafê gelê bindest werin pêşxistin û zagonên totalîter bi hişmendîya demokrasî werin çekirin. Raştiya hişmendîya azadî ewe. Doza millet yan jî doza netewî; hemberê pergala dagirkerî û kolonyalîzmê tekoşîna gelê bindest çareserkirina pîrsgirêka netew-dewlet dibîne. Rêxistina xwe bi nasyonalîzmê dimeşîne. Mafê çarenivîsiya, bi çekirina dewletekî serbixwe yan federal daxwaz dike. Têkoşîna bideştveanîna van mafan pîrsgirêka tekoşîna neteweyî-demokratîk didîne. Li gorî ramana doza millet, netewe ji kes, malbat, an jî ji mirovahiye pêştir e. Doza millet, wekî bîrdoziyekê, îdeala bingeîn e ku girseyan an dewletan di serdema modern de rêberiya wan kirîye ku bibin netewe. Doza netewî têgehên herî bingeîn a du sedsalên paşîn e. Nasyonalîzm ji bo avakirina netew-dewletên modern bingehekî pêdivî ye. Ew yek ji sedemên karesatên mezin e ku mirovahiye di du şerên cihanê de di sedsala biştan de kişand. Nasyonalîzm cihanbîniyek e ku her tiştî bi neteweyî dinirxîne. Em behsa rola doza sinifê û doza netewî li Kurdistanê bikin.

Li Kurdistanê partiyên ku tekoşîna xwe de doza sinifê dimeşînin hene. Ew tenê zirarê dide û hîn jî zirarê dide gelê Kurd û doza netewî û hêla demokrasîyê de paşketîne. Ji ber ku kategorîya doza wan şaş e û ji bo gelê bindest ne rewşa ne jî tekoşerê doza gelê bindestîne. Teorîkî-pratîkî Nasyonalîzm a Kurd, gelek pîsporek/ doktrînen cihanê serhildana şêx Ubedullahê Nehrî nîşan didin. Şêx şêx Ubedullahê Nehrî dema ku Kurdistan du parçe bu, hem bi Osmanlîyan hem bi Îranê re şer dikir. Dema ku netew-dewlet tune

bun, ew şêx şêx Ubedullahê Nehrî bi yekîtiyên kolektîfên netewî bi şêx serbixweyî yê, raştiya yekîtiya Kurdistanê dida nîşan danê û gor gelek pîsporan yekemîn şêx netew-dewlet bûye. Bêguman ew rêbaza şêx Ubedullahê Nehrî ji aliyê gelek serok û rêberin Kurd; wekî Seyîd Rîzo, Seîdê Kurd, Pêşewa Qazî, Mele Mîstefa Berzanî û yên serokê Kurd berdewam kirîye yên jî berdewame. Doza netewî temsîliyeta gelê bindest dike. Nîrxên gelê bindest dibin rêxistina xwe de dike remz. Nasyonalîzma Kurd de yek ji wan nîrxên netewî Ala Rengîne. Dibin wê Alê de Nasyonalîzma Kurd, doza netewî hên jî berdewame. Em dikarin Doza Netewî yanê Nasyonalîzma Kurd her car perçeyên Kurdistanê binirxînin. Nasyonalîzma Kurd li parçeyekî tesîra wî pozîtîf ser parçeyên dinê jî heye ji ber wê em bala xwe bidin Rojhilata Kurdistanê û tevgera modern a wê perça Kurdistanê bi navê Tevgera Rasanê...

Îran nêk erdnîgarî ye ku neteweyên cuda di nav xwe de digire. Îran xwedî dîrokek dirêje. 1979 de rejîma Xûmeynî gihîşte dêhilatê. Wê demê ve navenda terora Rojhilata Navîn hate damezrandin. Ew rejîma terorîst, serî de bi dijî gelê Kurd, li dijî mafên jinan, kedkaran, nivîskaran, demokrasî, azadî û hwd ava bû. Niha jî terora wê li rojhilata navîn fireh bûye. Rejîma Xûmeynî bûye remza gemarî, dizî, xwînxarî û navenda hemû xirabîya cihanê de. Hebûna wê rejîma totalîter, zordarî û paşverûye. Kiryarên xwe ye terorîstî bi rêxistinê terorîst û çeteyan ber firehtir kirîye, gelek dewletên rojhilata navîn, dibin bandrola xwe de girtiye. Aştengî hemberê Kurd a xurt kirîye. Îran buye navenda pîrsgirêkan û tevdanî û fitneya rojhilata navîn. Îran di pêvajoyek guherîna mezin re

»»»» Doma R: 5

derbas bibe.

Em behsa tevgera Rasan tesîra wê a pozîtîf ser Kurdistanê û Îran bikin

Tevgera Rasanê, tevgera moderne di tekoşîna Nasyonalîzma Kurd de û mafê gelan de, û tevgerekî pêşkevtiye. Her Kurdekî dilsoz û tekoşer dikare erkê xwe di tevgera modern a Rasanê bibîne. Tevgera Rasanê di tekoşîna azadîya Kurdistanê de Nasyonalîzma Kurd xurt kirîye, bingeha wê herî pîroz, girîng, Kurdperwer û dîrokiye, Ku ji aliyê Hîzbî

Demokrata Kurdiştana Îranê hatiye lidarxistin û bingeha bi wê tekoşînê, erk û rêbaza xwe berfireh kirîye. Temsîliyeta bingeha demokrasî û tekoşîna neteweyî dike. Di bingeha xebata mirovatîyê û tekoşîna rizgarîya netewî de gelek fireye. Rasan bi rêbaza xwe xurt û keçên qehraman hemberê zordarî û dagirkerîyê erkdar kirîye ji bo bideşt ve anîna azadîya Kurdistanê xebata herî girîng. Her Kurdekî dilsoz û tekoşer dikare erkê xwe di tevgera modern a Rasan de bine bicî.

Rasan pir fireh û dixebite da ku Îranekî demokratîk û federal çêbike ku tê de mafê netewî bideşt ve bê. Ew rengê tekoşînê ye ku rizgarîya di nav sinifan de

û gelên bindest bi îranekî demokratîk de pêşbînî dike. Tevgera Rasanê ji bo ku di dijberiya rejîma Îranê de roleke sereke bilîze, her ramanê demokrat û realîst dikare beşdarî tevgera modern ya Rasan bibe. Rasan ji bo xebatê pêlek mezin a tekoşînê ye û qadekî başe bo xebatkaran, kesayetên demokrat, kêmaneteweyî dikarin erkê xwe tê de bicîh bînin, çimku Rasan ya hemiyane û bo armanca hemiyan destpê kiriye. Ew hizr û rêbaza modernîta Dr. Abdulrahman Qasimlo ye, Wî beriya rejîma terorê, ev tekoşîn meşandî ye, Tevgera Rasanê ser wê rastîyê xwe erkdar, dibîne.

Rola Rasanê wek

Pêşmergeyên şar û şax li ser stratejî rêxistina û yekîtiya netewe Kurd bandor hebûye. Ew stratejî bi organîzekî realîst ji aliyê hîzbên rojhilatê Kurdistanê ve dikare were berfireh kirin û dê Tesîra wê li ser parçeyên dinê jî hebe. Modern a tevgera Rasan, di hêla serxwebûna Kurdistanê jî heye. Di şert û mercên rojhilata navîn de ger em bixazin serxwebûna Kurdistanê were ava kirin, avakirina dewletên modern wek rewşa Kurd a dibe ku dewletên dagirker û totalîter werin hilweşandin, û sîstemekî demokratîk û federal were avakirin. Rasan di wê qonaxê de moderne, erk û tesîra wê pozîtîfe, rola çêkirin û xortkirina nasyonalîzmê dilîze.

Birayê ne ji dayê, wekî telîsê kayê



N: Serbest Urmîye

de jî heya niha ku pitir ji 40 salan ji temenê rejîmê derbas dibe, taqim û girûpên cur bi cur di bin destûr û sergêriya rêberên rejîmê de hatine damezrandin û hemû hewil hatine dayîn ku korîdoreke Şî'e li bin siya rêberê Îslamî yê Îranê di herêmê de bo merema derbaskirina Îslama "Welayeta Feqîh", ava bibe.



Berader di zimanê Farsî de wate bira, zargotinek e ku piştî dagîrkirina destkevtên serhildana sala 1357'an a Rojî a gelên Îranê ji aliyê taqima welayeta Feqîh ve, kete rojeva zimanewaniya wê taqimê û darûdestekên wê. Ev gotin di hêla maddî de bi wateya birayê ji dê û bab ve nedihat gotin, belkî pitir zargotina taqimên girêdayê "Welayeta Feqîh" anku Spaha Pasdaran û destekên têkilîdar bi wê bûn. Dîtingeha wan jî ji vê zargotinê pitir aliyê olî û mesebê Şî'eyên rejîma Îranê ve bû. Li gor wê ramana wan dibe ku oldarên Îslamê, nemaze Şî'e, hemû bibin birayên hev.

Ew biratî jî demkê çêdibe ku şoreşa Îslamî ya Îranê hemû sînoran derbas bike û hikmê Îslamê di bin rêveberiya "Welyê Feqîh" anku rêberê şoreşa Îslamî ya Îranê de were bimeşe. Di vê derheqê

Di vê pêxemê de heya niha her carê bi awayekê lehiya xwînê hatiye birêxistin û li ser navê serxistina Îslamê û alîkariya birayên olî yên welatên ser rê û derdorê vê korîdore ku para pitir ji wan welatên Ereban in, xwîna xortên Îranê hatiye rijandin ku pişka herî zêde jî bi pîlangêriya Spaha Quds a rejîmê dimeşe.

Ka gelo birayên ku xwîna xortên Îranê li ser axa wan û di pêxema biratiya wan de tê rejandin, wan kuştîyan birayên xwe dizanin?

Ji bo ku em vê yekê bidin eşkerekirin, em pir dûr naçin. Îraq, Sûriya, Feleştîn û Lubnan ew welat in ku ji mêj ve ye meydana cilîdanê ya Spaha Quds a rejîma Îranê ne û hêza çekdar a Îranî ya Spaha han jî di şer û aloziyên wan de rolekî mezin dibînin. Dijberî û jihevheznekirina

desthilatdariya Ereb û Farsan, dîrokeke dûr û dirêj e û gelek şerên giran di navbera wan de hatine tomarkirin. Ji aliyeke din ve jî hatina rejîma Îslamî ya Îranê û rêxistin û damezirandina komên çekdar û şerker bi navên cuda û di welatên cur bi cur ên herêmê de û tevlîhevîkirina rewşa siyasî, aborî û ewlehiya herêm û cîhanê, destpêka qonaxê din bûye ji alozîkirina tekilî û dijberiya dewletên Ereb tevî Îranê.

Lê ya ku nû hatiye dîtin û nahêle ku welatên derdor xelkê Îranê li ser her nav û ramanekê rejîma Îslamî ya "Welayeta Feqîh" birayê xwe bihesibînin, zaniyariyên navenda Erebî ya lekolînên siyasî ne ku di sala 2019 heya 2020'an ên Zayînî de û di çarcoveya rapirsîyekê de ji hevbelatîyên 13 welatên Erebî weke Misir, Tûnis, Elcezayêr, Merakêş (Mo-


rocco), Morîtanî, Sûdan, Koweyt, Erebiştana Siûdî, Qeter, Urdin, Îraq, Libnan û Feleştînê hatiye kirin. Li gor zaniyariyên navenda han, para pitir a welatîyên welatên han dijberî siyasîyên rejîma Îranê di herêm û cîhanê de ne û rejîma Îranê û komên girêdarê wê, dijî ewlehiya cîhanî dizanin.

Rastî di vî wêneyî de xuya dibe ku di çend rojên borî de di nava bikarhînerên tora înternetê de dest bi dest belav dibe. Wêne raportê ji şandina termê çend kuştîyên Spaha Quds a rejîmê li Sûriyê dike ku di pêxema paraştina desthilata Be'is a Sûriyayê de hatine kuştin û termê wan bi terzekî sivik û bêrûmet di kartonên mûzan de hatine şandin. Eva diselimîne ku ew biratiyê ku rejîma Îranê bi terzê xwe di hewla afrandinê de ye, biratiya nedilxwazê gelên derdor e.

Nerîna Lîderan



“Benny Gantz”:
“Renge li aliyê Îranê hin bûyer biqewimin”.



“Mîşêl Ewin”:
“Lubnanê ti şîrîkek bona berevanî ji serbixweyiya xwe tinîne”.



“Kelly Craft”:
“Rejîma Îran aramiya cîranên xwe têk dide”.



“Cum`e Enad”:
“Em îznê nadin ti aliyek, Îraqê bo şerê navxweyî rabikêşe”.

Rejîma Tehranê xwekujî kiriye çand!



N: Eskender Ceiferî

Gelek caran jin yan jî keç, bi sedemên cuda dawiyê li jiyana xwe tînin. Lê ya rastî ev e ku xwekujî, heman çand e ku rejîmê bi awayekî neras-terast di nav xelkê de ber-fireh kiriye.

Di demên dawiyê de rêjeya xwekujiyê li Kurdistanê zêde bûye û li gora ku çalakvanên sîvîl didin zanîn, rêjeya salane ya xwekujiyê li wir ne kêmtirî rêjeya salane ya darvekirinê ye. Piraniya wan kesên ku xwe dikujin jî, jin in.

Ji berê ve jin weke jiyan tê dîtin û bi rêjeya bilind a xwekujiya jinan jî em dikarin bêjin jiyan û mirovahî ji nav diçin.

Xwekujî, kiryarek e ku mirov bixwe tê de biryarê dide dawiyê li jiyana xwe bîne. Mirov dikare bêje sedema sereke ya vê kiryarê li hemû civakan bêhêvîbûn e. Xwekuj, ji her çandekê bi her zimanekî û ji her neteweyekê be, digihe astekekê ku li gor wî/wê neman jê re bi mifahtir e ji jiyane.

Li gora zanyariyên ji çalakvanên Kurd, piraniya wan xwekujiyan ji ber sedemên weke abûrî, tûşbûna bi madeyên hişber û ji ber pirs-girêkên malbatê ye.

Eger kerameta mirovan ji hikûmetan re girîngtir be, divê kesekî sîvîl nekare bi hêsanî çek û sîlahan bi deşt bixîne. Hebûna çek û sîlahan di civakekê de dikare fikra tundrew li pey xwe ve bîne. Eger salane 200 welatîyên

Kurd ji aliyê wezareta Dadê ya Komara Îslamî a Îranê ve tenê darvekirin, zêdetirî 500 kesan jî dawiyê li jiyana xwe tînin.

Hebûna hebên naskirî bi Birinc û Siyanor jî dikare rê li ber xwekujiyê veke. Ew kî-jan dermangeh e ku li Îranê, bêy biryara pizîşkan, heban nefuroşe!

Salane 800 hezar kes heta milyonek kesan li hemû cîhanê bi şewazên curbicur dawiyê li jiyana xwe tînin.

Rêkar û rênimûniyên ayînî, dema ku tevlî siyaseta dibin, fikra mirovan jî diguherin. Li gor ola Îbrahîm, jiyan tiştêk pîroz e lê xwekujî jî gelek mezmûm nîn e. Japonî jî xwekujiyê weke qerebûya pêşneya xirab dibînin. Li Hindîstanê jî jina ku zilamê wê dîmir, dikarî xwe bavêje ser agirê ku laşê zilam pê dişewtînin da ku ew jî dawiyê li jiyana xwe bîne.

Perwerdekirina zarokan li gor fikrên qedîm jî dikare sedemeke din a xwekujiyê be. Hin ji wan kesên ku bi vî rengî tene perwerdekirin, tevlî girûpên tundrew dibin û xwe di berjewendiya wan de dikujin. Li Kurdistanê Îranê asta bilind a xwekujiya ji ber sedemên siyasî û abûrî, vê şewaza xwekujiyê vedîşere.

Li gelek ji welatên Rojava, êdî xwekujî yan hewla xwekujiyê weke Tawan nayê hejmarkirin. Lê belê divê ji bîr nekin ku hêviyên jiyan xelkê li welatên Rojava eger gelek jî baş nebe, lê hêjayî kerameta mirovan e.

Li hin welatan şewazeke xwekujiyê bi navê Xwekujiya Alîkar heye. Hin çalakvan dibêjin hikûmeta Îranê jî bi kiryarên xwe ên abûrî û siyasî bûye alîkariya xwekujiya qurbanîyan dike.

Êdî li hin welatan şewirmendên xwekujiyê jî hene ku hêsanîrîn rê ji bo xwekujiyê, nîşanî xelkê

didin. Lê belê bi ti awayekî mirov nikare Îranê û Kurdistanê Îranê bi welatê Rojava re danî ber hev. Wê demê nîrxandina civakekê bi civakên din re çê dibe ku asta jiyanê welatîyên wan jî weke hev be.

Hin siyasîyên Îranê pêşniyar dikin ku termê wan kesên ku xwekujiyê dikin, di qebriştanên gund û bajaran de neyên binaxkirin. Lê belê wan ji bîr kiriye ku divê çavkaniya xwekujiyê bê hişkkirin.

Mentiqa wan kesên Atêna berê ya Yonanê ye ku kesên bêy erêkirina hikûmetê dawiyê li jiyana xwe tînin, ji binaxkirina di goriştan de dihatin bêparkirin û bê navûnîşan li dervey goriştan an dihatin binaxkirin. Dibe ku ew kiryar jî bikarin meyl û heza xelkê ji bo xwekujiyê kêmkirin. Lê dîsa jî nabe hikûmet ewqasî xemsar be ku li dewsa zuhakirina çavkaniyê, qurbanîyan weke tawanbar bide nasandin yan jî piştî xwekujiyê, hikûmet deşt danî ser milk û malên wî/wê.

Deştîlata ku herî zêde bi şeweyek radîkal li hemberî vê mijarê derdiket, Berîtanya di sedsalên 19'an de bû. Eger li ser kesekî/ê bihata îsbatkirin ku hewla xwekujiyê daye, ew kes dihat darvekirin. Mentiqa deştîlatdarên wê demê en Berîtanya ji bo îdamkirina kesên ku deşt davêjin xwekujiyê ew bû ku tirsek li cem xelkê çê be û li encama xwekujiyê bifikirin.

Ji xeynî sedemên han, hin bûyerên din jî çê dibin. Çendîn caran heta niha li Kurdistanê Îranê bûyerên bi vî rengî derketine ku keçek ji aliyê saziyên ewlehî ve tê girtin. Tê gotin ku hêzên navbirî di girtîgehan de deştîrêjiyê dikin ser wan keşan ku bi sedemên siyasî hatine girtin. Ji ber vê jî, hin keçên Kurd piştî ku serbest tene berdan, dawiyê li jiyana xwe tînin da ku navekî xirab nekeve ser wan.

“Girêka kor” ya Îranê li Sûriyê



N: Samira Al-Mesalima

N: Ebdulazîz Qasim

Neh salên derbasbûyî ji xelkê Sûriyê re xuya kir ku destwerdana navnetewî ya pêdivî ji bo bidawîkirina hevrikiya li Sûriyê, ne di nav bijardeyên hemû aliyên têkildar bi dosiyeya Sûrî de ye, tevî alîgirên herdu aliyên dijber (rêjîm û opozisyon) bûne hevpar û bazirganiyê li ser vê hevrikiyê dikin, ev yek wê metirsiyê zêde dike ku heye Sûriya ji bazinê biryara navnetewî ya rast ji bo rawestandina karesatê derkeve, hevdem ligel berdewamiya hevrikiyê, ku her du aliyên xwecihî wê parçe bibin û hejmarê wan zêde bibe, û Sûriya wê bibe bazara berjewendiyên navnetewî û herêmî.

Êdî Sûriya (rêjîm), wekî berî destwerdana Rûsiyayê di 2015'an de, ew hêza yekgirtî nîne ku bibe pergala bo parastina Îranê, herwiha jî ku Sûriya Esed di bin parastina Rûsî de, Sûriyayek hevgirtî nîne, dabeş bûye di navbera du aliyên herêmî de, wekî niha ku temaşê li doseya Sûrî li ser maseyên diyalogê û çareseriyê wê li gorî berjewendiyên li gel Rûsya û Îranê dibe, û herwiha ku Amerîka jî nêrîna xwe li ser vê doseyê bi rêya nixandina pêşkeftina doseya nuklerê ya Îranê, yan jî bi rêya têkiliyên xwe yên li gel Rûsyayê dinirxîne. Îro gerewa Îranê, li ser vegera demokratîk li Koçka Spî ye, û li ser baştirkirina têkiliyên di navbera xwe û Amerîka de, ne bi tenê li ser vegera li pêş çar salên berî rêveberiya serokwezîr Donald Trump, yê ku di 20'ê kanûna paşîn de bidawî bibe, zêdetir dixwaze ku Îsraîl rêgiriya li rola wê di navçeyê de neke, û têkiliyên kûr li ser têgihiştinên berê yên ligel Demokratîk li ser doseya navkî, û xalên têkiliya neyekser di navbera xwe û Amerî-

ka de ava bike, û bi rolên temamker rabe heta bigihîje astê ku bi rola polîsê Amerîkî li Sûriyê û Rojhilata Navîn bi giştî rabe, ku vê yekê tirsê di nav dewletên Kendavê de peyda kiriye, lewra dewletên erebî yên kendavê hawara xwe car digehênin Îsraîlê, û car digerin ji bo xwe nêzîkî Îran û Tirkiyê bikin û rêyên diyalogê bi wan re vekin ji bo xwe biparêzin ji rola wan ya di rojên pêş de. Ji aliyekî din, gerewa Îranê li ser helwesta hukûmetên Ewropî ye yên ketina di nav aloziyên aborî de, û di bin zexta redkirina penaberan, û bertekên pandemiya Corona de, herwiha ku Îran; raştiya helwesta dewletên Ewropî derbarê biryar û sizayên Amerîkî yên “Trump” li dijî wê dizane, ku dewletên Ewropî yên hevparên rêkkestina navîkî bac û bihayên mezin dane ji encama wan sizayan, û bi neçarî xwe ji wan girêbestên veberhênanê yên li gel wê xwe vekişandin, ku Ewropa di wê baweriyê de ye ku vekişîna Amerîkî ji rêkkestina navîkî bû delîlê ji bo ku Îran programa xwe ya nuklerî û mûşekî bi pêş bixe, û dibîne ku dubarekirina rêkkestina 2015 (5+1), take dergeh e ji bo bikaribin bi rêya wê danûstandinan ji bo guhertina reftara Îranê bikin, zextê bêxin li ser zêdexwaziyên wê yên nuklerî, di çarçova rêkkestinekê de ku bi kêrî pêşkeftinê be. Îran, ji ber vê yekê, çaresernekirina rewşa Sûriyê (ango, berdewamiya rewşê niha li Sûriyê), bo xwe bi baştirîn çareserî dibîne ku paşê wê bikaribe hin rêkkestin û girêbestan çêbike tê de hejmongeriya xwe bi awayekî aktîv li Sûriyê û Libnanê bisepîne, û her ji destpêka ku Amerîka dosiyeya Sûrî raspardî Rûsiyayê kir di rêkkestina wezîrên derve yên her du welatan, John Kerry û Sergey Lavrov, di îlona 2016 de, ku Îran dixebite û kar ji bo têkşikandina her agirbestekê yan pêvajoya çareseriyê dike, û hemû rêkkestinan binpê dike heta yên ew bi xwe tê de alî, wekî heman peymanên

Astana, ku ew wekî kirasê “Osman” bikar tîne, gava ku bixwaze wê li ber xwe bike, û wê hevparê çareseriyê be, yan jî dema ku pêdivî be, wê ji ber xwe dike û bibe rêgir.

Di çar salên borî de, Rûsiya nikarî rêkkestinekê di navbera aliyên Sûrî (opozisyon û rêjîm) de li ser hikûmetê yekgirtî peyda bike, ku bilez dest bi pêvajoya nûavakirina Sûriyê bike ji bo qerebûkirina ziyanên xwe, piştî ku ew bû hevparekî rastîn di têkbirina hejmongeriya Îranê de, bi rêya dîrkerîna wê ji ser maseya danûstandinên navnetewî yên derbarê Sûriyê, û herwiha ku Rûsiya di salên borî de xwe bi nûnerê rêjîmê pêşkêş dikir di danûstandinan de, û wê hêvî dikir ku Sûriyê bibe kartek “lêkguherînê” li ser dosiyeyên wê yên li gel Ewropî û Amerîkî, lê ji ber wê bi rêya peymanên Astana ku nikarîbû tevaya axa Sûriyê kontrol bike û di nav de Idlib û herwiha ji ber ku wê bi sivikatî li armancên Tirkiyê li Sûriyê temaşê dikir, vê yekê Rûsiya vegerand xala destpêkê ya ku wê li Sûriyê dike hevkarê Îranê, ne ku alternatîf jê re. Rûsiya, niha li Sûriyê, aliyek lawaz nîne, lê ew aliyê herî bihêz jî nîne nemaze niha ku heye nêzîbûnek di navbera Îran-Amerîkî de peyda bibe, û ew dizane ku hejmongeriya wê li Sûriyê di serdema Trump de wê ne heman hejmongerî be di serdema serokatîya “Joe Biden” de. Ji ber vê yekê, îmkana heye Rûsya razî bibe li ser çareseriyê siyasî li Sûriyê di bin biryara 2254 ya civata ewlekariya navnetewî de, lê dibe daxwaza gerantiyên mezin ji bo parastina berjewendiyên xwe yên aborî û leşkerî bike. Rûsya, wekî destpêkê daxuyanîyên xwe zêde bike û ragehîne ku çareserî li “Cenevr”ê ye, û ne li deverê din e, bi awayekî demkî wê palpiştîya civatên Komîta Destûrî bike û de xwe ragir e heta siyaseta Amerîkî li Sûriyê zelal bibe, û dema rêveberiya Amerîkî

ya nû tevgera wê esmanî li ser Sûriyê dirêj bike, wê gavê Moskow dê çareseriyekê li ser du astan peyrew bike: Di berjewendiyên bicihkirina rêjîmê de, wekî take hêz di bin desthilata wê de, li gel hin guhartinan bi beşdarîkirina opozisyonê bi awayekî lawaz û bêbandor, yan jî ji bo berjewendiyên paqijkirina tevgera rêjîmê, çî ji serê wê be, çî ji navîn be, wekî ku niha tê pêşniyarkirin, û derbaskirina hin guhertin di form û sîmayê hikûmetê de li gorî destûra 2016'an ya ji aliyê opozisyonê hatibû pêşniyarkirin, bi awayekî ku berjewendiyên Kurdistanê bêne garantîkirin ku Amerîka li Sûriyê wan diparêze, li gel gerantîkirina hin berjewendiyên oposizyona Sûrî. Lê wekî din wê Sûriya bi “girêka kor” ve girêdayî be, heger hat ku Demokratîk Koçka Spî (Biden) li gorî geşbîniya Îranê be! Wê demê ku Îran wê desthilata xwe li ser Sûriyê dirêj bike, û wê berjewendiyên Rûsiyayê di serbazgeh û peymanên wê yên aborî de dorpêç bike, û wê rêjîma Sûrî, bi serokatîya Beşar Esed ber bi reformên kêmîr biçe, wê desthilata Esed bo heft salên din berdewam bike ku serokatîya wê ya nû de nîva îsal de destpê bike, di dema wê serkêşîya pêvajoya siyasî ji bo reformkirina destûrê bi “firaksyonên opozisyonê” re, di heft salên bê de bike.

Dibe ku xirabîya Rûsiya kêmîr be, dema ku mîletê Sûriyê opozisyonê nîştimanperwer ya xudan bernamêyek rasteqîn û nîştimanî hebe, ku danûstandin ji bo berjewendiyên wan be, û civaka navnetewî xîstibe li hember yek bijardeyê ku mafê çarenivîsa gelan bi civaka navnetewî dabe qebûlkirin, û siberoja xwe ava kiribe, heta li ser hesaba qebûlkirina çareserî, guherîn û reformxwaziyên vekirî, ne bi destê ti aliyan yên dixwazin bibin hevkarê desthilat û hikûmetê bi rêya hêza otorîter, hesin, agir û zindanan.

Nîşe: Samira Al-Mesalima
Sernivîsara berê ya rojnama
Tishreen ya fermî bû

Rêya navdewletî ya geliyê “Sûlê” ya Urmîyê bo xelkê rêyekî metirsîdar e

Di devera “Soma û Bira-dost” a ser bi bajarê Urmîyê rêya navdewletî “Geliyê Sûlê” hilkevîtiye ku ew rê bûye cihek bo rûdaw û karesatan û canjidestdana welatiyan.

Welatî bas ji vê yekê dikin ku ev rê bi sedema vê ku ji aliyê rejîmê ve nayê nûjenkirin salane maşînên geştiyaran, mînbûs û bi dehan cureyên din ên maşînan raştî bûyeran dibin û ajotvan canê xwe ji deşt didin.

Ew rêye “gardrêyl” nîne, û pir kevin e û rêya wê jî teji çal in.

Li gorî gotina welatiyan di vê



deverê de heya niha cend caran bi awayê nivîsîn daxwaz ji rejîmê kirine ku pirsgerêkên wê rêyê çareser bikin, lê ti aliye pêwendîdar bersivdar nebûye.

Salane dehan welatî di Kurdiştanê de bi sedema nesitandarbûna wan rêyan bi bûyerên hatinûçûnê canê xwe ji deşt didin yan jî birîndar dibin.

Du welatiyên xelkê bajarê Pîranşehrê bi 10 sal girtîgeha teizîrî hatine cezadan

Du welatiyên Kurd yên bi navên “Umer Xagzade û Ebas Sidîqî” xelkê gundê “Şêlm Caran” yê ser bi bajarê Pîranşehrê, ji aliyê dadgeha şoreş a wî bajarî ve, her yek ji wan bi 5 sal girtîgeha teizîrî hatine cezadan.

Dadgeha şoreş ew du welatiyên Kurd bi tohmata “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” ceza dan û ew cezaye jî di heyama çen rojên derbasbûyî de bi wan re hatiye ragihandin.

“Umer Xagzade” kurê Hasil roja Yekşemî 11ê Coz-

erdana îsal, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî û lêdan û îşkenceya hêzên ewlehî hatibû binçavkirin û bo lêkolînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmîyê hatibû veguhaştin.

Ew welatiyê Kurd roja Yekşemî 22ê Pûşperê, piştî bi dawîhatina heyama lêkolîna wî bo girtîgeha bajarê Nexedeyê hatibû veguhaştin û deşt pêka meha Gelawêjê, bi danîna barimteyê bi awayekî demkî hatibû azadkirin.

“Ebas Sidîqî” êvara roja Înê 26ê Xakelêweya îsal, bi bê



hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo lêkolînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmîyê hatibû veguhaştin.

Ew welatiyê Kurd deşt pêka meha Pûşperê, piştî bi dawîhatina heyama lêkolîna, bi danîna barimteyê hatibû azadkirin.

Seyîd Necmedîn Heyderî : “Bila em hemû jîngehê biparêzin”

Seyîd Necmedîn Heyderî yek ji kesên xuya û mezin ê Ola Yarsan di nameyekê de daxwaz ji peyrewên wê Olê kiriye ku bi hev re bi hemû şîyanekê hewilê bo paraştina jîngehê bidin.

Navbirî di vê nameyê de rû li peyrewên Ola Yarî belav kiriye “ez daxwazê ji hemûyan dikim li paraştina hemû baxat, werzêrî, sîstema avdêriyê, jîngeh û dariştanên deverê hewil bidin û tevî vê ku li ziragihandin bi jîngehê têkdana jîngehê xwe biparêzin û hewla paraştina jîngehê bidin”.

Daxwazkariyên navbirî bo paraştina jîngehê hewlek e dijî siyaseta rejîma Îranê di Kurdiştanê de.

Rejîma Îranê salane bi zanebûn dariştan û çîrîngehên Kurdiştanê agir berdidê ku zirarekî zaf digihe bi surûştî Kurdiştanê.



Karapetê Xaço û serpêhatiyên wî

Nêzî sed sal temen ji bo neteweyekê û şopandina rêçika Evdalê Zeynikê û saxkirina çanda Kurdî û xwdiyê zêdetir sedan kelim, ev Karapetê Xaço ye.

Karapetê Xaço, bi eslê xwe Ermenî ye. Lê belê ew bi deng û avazên xwe dengbêjek ji dengbêjên Kurd ên sereke ye.

Karapetê Xaço xwendevariya wî nebû û nivîsîn nedizani ew tenê bi gotin û bêhîstina kilaman bo yek carê werdigirt û di singê xwe de dihelâ û pêşkêşê nifşa pey xwe dikir.

Karapetê Xaço di zarokatiya xwe de rûbirûyê komkujiya Ermeniyên ku ji aliyê dewleta Osmanî ve dihat kirin, dibe. Dê û bavê wî, li ber çavên wî tene kuştin, ew bi her sê xwişk û birayên xwe ve bi xwedîlêderketina hin Kurdan ji kuştinê xilas dibe, mixabin êdî zarokê sêvî û bi nasnameya xwe ya veşartî ve sêviyekî bexwedî ye. Bes ku ji komkujîyê xilas bibin, her çar xwişk û bira nasnameya xwe vedişêrin û li deşta Xerzan, di nav Kurdên wê deverê de dijîn û bi zimanê Kurdî mezin dibin.

Karapet di dema xortaniya xwe de, şivan û gavanê pez û dewar, di heman demê de jî di herêmê de dengbêjek naskirî ye. Di gera xwe ya di nav gundan de kilam û stranên Kurdî ji ber dike û distirî. Deng û dengbêjiya wî di nav gundên herêmê de belav dibe. Li ser şerê ku Filîtê Quto têda tene kuştin, stranek derdixe, ku Filîtê Quto mîrxasek ji Eşîreta Reşkotan e, ku ew eşîret di dema komkujîya Ermeniyên ku li gelek kesên Ermenî xwedî derdikevin û wan ji mirinê xilas dikan. Ji wan Ermeniyên yek jî Karapetê Xaço ye, ku ew li gundê Filîtê Quto, wek gencekê demeke dirêj dijî.

Dem demeke metirsîdar e. Şerê Cihanê yê yekemîn qediya ye. Di dema şer de koka Ermeniyên ji bin de



hatiye qelandin.

Piştî şer, dewleta Osmanî diherife û piştî Komara Tirkîyê ava dibe. Dewleta nû a avabûyî ya Tirkîyê vê carê komkujîya Kurdan dike û serhildan û komkujî dibe qedera Kurdan. Bi têkçûna serhildana 1925an rêvebirên serhildanê tene îdamkirin, bi hezaran Kurd jî tene kuştin. Li seranserê Kurdistanê zulm û zordariyek zêde deşt pê dike û malbatên Kurd ên ku xwedî bandor tene sirgûnkirin.

Di wan salên bêyom de Karapetê Xaço jî berê xwe dide binxetê û derbasî Sûrîyê dibe. Wê demê Sûrîye di bin bandora Fransayê de bû. Karapet wê demê di nav artêşa Fransayê de wek lojyoner cîh digre û nêzî 15 salan wekî eskerekê di nav artêşa Feransayê de dibe.

Wê demê Ermenîstanê bangêjiyek belav kir û daxwaz li hemû Ermenîyên li dervayî Ermenîstanê kir, ger ku ew bixwazin, dê bikaribin vegerin welatê xwe. Karapet jî li ser wê bange-waziyê bi jin û zarokên xwe ve berê xwe dide Ermenîstanê û li wir bi cîh dibe. Li Ermenîstanê jî hejarî û belengazî pêsîra wî bernade.

Sala 1955`an radyoya Rewanê bi zimanê Kurdî deşt bi weşana dike û Karapet jî wek dengbêjek Kurd di nav hunermendên radyoyê de cîh digre. Di radyoyê de jî, ji bilî zimanê Kurdî, tu car bi zimanek din heta bi zimanê xwe yê zikmakî jî kilam û stranek neştraye. Lewma ew bi eslê xwe herçiqas Ermenî be jî, bi deng û avazên xwe, bi stran û hunera xwe jî dengbêjekî Kurd e.

Karapet di dawîya jiyana xwe de mîna gelek hunermend û rewşenbîrên Kurd rûbirûyê jîyanek bi hejarî û belengazîyê dibe. Çend sal berî mirina xwe di hevpeyvînek xwe de gilî û gazinek xwe ji Kurdan dike û di derheq jîyana xwe de wiha gotiye:

“Hinek rojan dar nebûn em bixine nav soban û xwe gerim bikin û em bi sedema sirê ji nav nivînên xwe der nediketin. Qedera min jî ji qedera dengbêjên Kurd yê din cudatir nîne. Emrê min bi dengbêjiyê re derbas bû. Lê 50 mîlyon Kurd nikaribûn li min xwedî derbikevin...”

Karapetê Xaço, di 103 saliya xwe de li gundê Solxoza Çaran, di xaniyek ne gelek baş ku bi tenîkeyan hatibû çêkirin koça dawî kir û ji belengazîya xilas bû. Deng û avazên wî yê bêmehpa û berhemên wî jî man bû nifşa nû.

Geleg dengbêjên me yê Kurd niha hene ku li ser şûpa Karapetê Xaço dimeşin û nahêlin ew kevneşûpiya gelê me ji nav here û navdarên wekî Evdalê Zeynikê, Şakiro û dengbêj Reşo û Karapetê Xaço bi awayê deng dîrok, çand û kevneşûpiya gelê me sing bi sing gihandine nifşa niha.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Z êdetir li 300 sal cezaya girtîgehê, heya îdam û lêdana qamçîan bo 88 welatîyên Kurd di heyamê 9 mehên sala 1399an de	lêdan	Têkdana nezma giştî:6 halet	Belav kirina nûçeyên neraşt: 1 halet
Pêka amara ku di navenda amara saziya mafê mirovî a “Kurdpa”yê di 9 mehên sala 1399an hatiye tomarkirin, bi giştî 88 welatîyên Kurd bi tohmata “Ewlehî” ji aliyê dezgeha qezayî a hikûmeta Komara Îslamî a Îranê, bi girtîgehê û cezayên din hatine cezadanê.	piştraşt bûna cezaya îdamê ji aliyê dîwana bilind a dad:3 halet	Endambûn di girûpên tundra yên olî:4 halet	Miharibe: 1 halet
Cezaya herî kême ku hatiye sepandin 2 meh girtîgeh û cezaya herî zêde îdam bûye.	dûrxistin bo deverên dûrdest: 1 halet	Şewtandina benêra Qasim Silêmanî: 3 halet	Eşkere kirina belgeyên hikûmetê:1 halet
Girtiyê Siyasî_Olî yên ku bi îdamê hatine cezadan:2 halet	cezaya malî:250 milyon timen	Peşdarî kirin di kombûnan bi merema çekirinatevdaniyê:2 halet	Biwarê çalakiyên parek ji wan kesan ku hatine diyar bûn:
girtiyên tezîrî: 276 sal û 3 roj	Tohmetên ku bi ser wan de hatiye sepandin:	Sîxurî kirin bo welatên din:3 halet	7 çalakên Olî, 6 çalakên Jîngehî, 5 çalakên Çandî, 5
girtiyê telîqî: 45 sal û 3 meh û 1roj	Hevkarî digel Partên Kurdî yên dijberî hikûmeta Îranê:43halet	Kombûnên tebanî:3 halet	Rojnamevan, 5 çalakên Medenî, 3 girtiyê Siyasî, çalakên warê Jinan û çalakên warê Kedkarî, endamekî Parta yekîtiya netewî, mamostayekî zanîngehê, 4 kes ji binçavkiriyan meha Xezelwera par, endamê daykên aşî û lêkolerekê Kurd.
lêdana qamçîan: 304 derbe	Piropagende dijî nîzamê:20 halet	Serpêçî kirin û bê rêzî kirin bi hikûmet û memorên hikûmetê: 1 halet	Navenda amara saziya mafê mirovî a Kurdpa
	Beşdarî kirin di kombûnên nerizayetîyê di meha Befranbara sala 1396an di bajarê Bane yê li derheq kuştina Kolberan:10 halet	Derbasbûn li sînor bi awayekî neyasayî: 1 halet	
	Cehdkirin bi dijî tenahiya neteweyî:11 halet	Helgirtin û kirin û firotina çekûçol:1 halet	
		Endambûn di girûpên dijberî nîzamê: 1 halet	

Kuştin û birîndarbûna 1382 Kolberan li sala 2012an heta 2020an

Navenda amarî ya Saziya Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê li dawîya sala 2020an a Zayînî di raporek amarî de amara kuştin û birîndarbûna kolberan di 9 mehên derbasbûyî de belav kiriye.

Amar bi wî awayî ye.

Li sala 2012an heta 2020an 1382 kolber hatine kuştin û birîndarkirin (469 kuştî û 913 birîndar)

28 kes ji wan kolberên ku hatine kuştin û birîndarkirin temenê wan jêr 18 salî bûne.

%78 ji wan kolberan bi teqeya raşteraşt a hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hatine kuştin û birîndarkirin.

Mirin û birîndarbûna wan bi sedema kevtin ji bilindahiyên ve %7 bûye.

Bi sedema sir û seqem û hatina renî %6 bûye.

Bi sedema teqîna mînê %5 ji mirin û birîndarbûna kolberan bûye.

Amara kuştin û birîndarkirin pêka amara salên 2012an heta 2020an wiha ye:

Li sala 2012an 44 kes hatine kuştin 29 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 73 kes

Li sala 2013an 38 kes hatine kuştin 54 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 92 kes

Li sala 2014an 34 kes hatine kuştin 55 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 89 kes

Li sala 2015an 42 kes hatine kuştin 30 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 72 kes

Li sala 2016an 51 kes hatine kuştin 71 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 122 kes

Li sala 2017an 67 kes hatine kuştin 153 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 220 kes

Li sala 2018an 80 kes hatine kuştin 158 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 228 kes

Li sala 2019an 70 kes hatine kuştin 180 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 250 kes

Li sala 2020an 53 kes hatine kuştin 183 kes jî hatine birîndarkirin, bi gelemper 236 kes

Giştî: 469 kes hatine kuştin 913 kes jî hatine birîndarkirin bi gelemper 1382


Amadekirin: Evîn Mistefazade

Rejîma Îranê mifahên xirab ji hejariya xelkê werdigre

Karbideştên rejîma Îranê bo wê ku xelkê bo aliyê xwe ve bikêşin gotine ku her kesek zarokek jêr temen 5 sal hebe emê 1 milyon Tumen pere bi wan re bidin.

Pêka amarên fermî yên rejîma Îranê di dema navnîvsînê de bo wergitirina alîkariya 1 milyon Tumen ji aliyê rejîma Îranê ve, 17 milyon serpereştên malbatan navên xwe nivîsîne, lê bi sedan hezar malbat hene ku dahata wan kêmtir ji 2 milyon Tumen e û ew alîkariya rejîmê bi wan re nehatiye danê.

Her roj di seranserê Kurdistan û Îranê de xelkê hejar û bîrsî dijî hejarî û kêmdahatan xwenîşandanan bi rê ve dibin, niha di salvegera kuştina terorîst “Qasim Silêmanî” de, rejîmê ev yek di nav xelkê de belav kiriyê, her kesek ku zarokek jêr temen 5 salî hebe bo ew hejmara ku di



nav xelkê de hatiye belav kirin dê pêwendî bi wan re bê girtin, heta ku 1 milyon Tumen bixine ser hesaba wan.

Rejîm dixwaze bi vê rêyê ve li hejariya xelkê mifahên xirab werbigire û bi şandina kortenaman xelkê wek alîgirê xwe nas bikin û eva di halekê de ye ku xelk dizanin sedema sereke ya hejariyê xwedî re-

Sala 2021`an sala herifîna rejîma Îranê

2021

